## Cejna Qurbanê pîroz be!

Em hêvî dikin ku Cejna Qurbanê bibe sedema destpêkirina serdemeke wisa ku tê de jiyana demokratîk a ku herî zêde pêwîstiya me pê heye xurt bibe, hiqûq edaletê belav bike, azadî serdest bibe û nan bi awayekî dadperwer û wekhev bê parvekirin.

Di van rojên dîrokî de ku em di Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk re derbas dibin, tiştê herî bi xêr ji bo Tirkiye û Rojhilata Navîn pêkhanîna demokrasiyeke xurt û aştiyeke birûmet e, dabînkirina aştiya civakî ya bi edalet û heqane ye.

Bi hêviya gihîştina rojên ku hemû astengiyên li pêşiya siyaseta demokratîk rabin û li ser bingeha hemwelatiya wekhev siberojeke azad û aştiyane bê avakirin. Em ê têkoşîna xwe ya ji bo avakirina siberojeke hevpar û civakeke demokratîk bidomînin.

Em Cejna Qurbanê ya hemû gelên xwe pîroz dikin. Em hêvî dikin ku ev cejn bibe destpêka jiyaneke nû ku tê de edalet, wekhevî, demokrasî û azadî serdest be.

**Tulay Hatimogullari** - **Tuncer Bakirhan**

**Hevserokên Giştî yên Partiya DEMê**